Awayên din yên xwendina lîseyê

Ji bilî 18 bernameyên neteweyî, dîplomeya navneteweyî (International Baccalaureate (IB)), xwendinên pêşengiyê, xwendinên şagirdiyê (di nav bernameyên pîşeyî de), xwendinên werzişê, xwendinên wergirtina xwendekaran ji seranserî welatî û yên ku jê re corên taybetî tê gotin hene. Tu dikarî li vir bêtir li ser van alternatîfên cuda bixwînî.

XWENDINA ŞAGIRDIYÊ

Îmkan heye ku tu wek şagird tevlî bernameyeka pîşeyî bibî. Tu dê wek xwendekarên ku bernameya pîşeyî li xwendingehê dixwînin heman zanyariyan werbigirî.

WERZIŞ

Îmkana ku mirov xwendina xwe ya lîseyê û werzişê di sewiyeya bilind de bi hev re girê bide.

CORÊN TAYBETÎ

Corê taybetî xwendineka lîseyê ye ku tev yan beşek ji pisporî yan bernamekûrkolîn ya xwendinê ji bernameya neteweyî cuda ye.

XWENDINA PÊŞENGIYÊ

Zanyariyên fireh û kûr di madeyên ku ji bo xwendinê taybetî ne.

BERNAMEYA DÎPLOMEYA NAVNETEWEYÎ (INTERNATIONAL BACCALAUREATE DIPLOMA PROGRAMME (IB))

IB bernameyeka amadekariya xwendina bilind e û xwedî îmtîhaneka naskirî ya navneteweyî ye. Dersdan herî pir bi îngilîzî ye.

TEKNÎKA BALAFIRAN

Xwendina teknîka balafiran xwendineka pîşeyî ye û xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike wek mekanîstê balafiran yan helîkopteran kar bike.

XWENDINA TEKNÎKA HÊZA DERYAYÎ

Xwendina teknîka hêza deryayî xwendineka pîşeyî ye û xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike bo nimûne wek teknîkerê hêza deryayî û teknîkerê sîsteman yê hêza deryayî kar bike.

XWENDINA TRAFÎKA DERYAYÎ

Xwendina trafîka deryayî xwendineka pîşeyî ye û xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike wek deryavan, hostayê motoran yan hostayê elektrîka keştiyan kar bike.

XWENDINA TEKNÎKA TRÊNÊ

Xwendina teknîka trênê xwendineka pîşeyî ye û xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike wek mekanîstê trênê yan mekanîstê sexbêrîkirinê kar bike.

PÎŞEYÊN LAPONÎ

Xwendina pîşeyên laponi xwendinek e ku xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike wek lênêrê gakûviyan, karkerê kardestên laponî yan rêber ji bo balkêşiyên siruştê/xwezayê, kulturê û xwarinê di endustriya mêvandariyê de kar bike.

XWENDINA REQASÊ PÎŞEYÎ

Xwendina reqasê pîşeyî xwendinek e ku xwendekaran ji seranserî welatî werdigire. Ew ji te re ye yê ku hez dike wek reqasê klasîk yan reqasê serdemê kar bike.